Bo çî…?

Viyan Mizûrî

Boçî…?
Boçî li gel pêjna
Hemû siharan
Min hişyar dikî
Li gel çirkêna peqîna
Xûsara bîrhatinan min radikî ve
Boçî, manşêtê rojnameya min
Herroj,
Bi te dest pê dike?
Dengê te
Min dikêşit ser pencereyê
Li pişt sîngê çend çiyayan re
Di nav mija çend pêkdanana
Zarokiya dêmê te
Di şûşeyek şikestî re nîgar dikim
Boçî, ma min negotiye
Ez û tu çayê
Yêdî pêkve venaxwin?
Boçî li gel lêdana zenga
demjimêra min hemû sipêdeyan
Tu dibî wext,
Dibî çerx
Dibî deng
Di guhên min de?
Ma me negotiye, em jêk xilas
Duhî jivan bû
Tu… evro dihêyî çî?
Min nevêt…di jivanê
nepeymankirî de bibime jivan ve
Eza ji tenhabûna xwe xerîb bûyîm
Pîçekê here wêrve
Bi tenê bo bêhnekê
Ji bin balgîhê min were der
Min divêt rabibim û birûnim
Tu destê min negirî
Bixwim vexwim tu
Li sifreya min hazir nebî
Ji nav mijûlankên min bihêyî der
Tu bi Xwedê bes bo bihnekê
Ji nav tîkên hizrên min
Xwe bide paş
Da xwe bidine yek
Da bibin yek